Şopdara Rastiyê ye
# Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1006 | 19-Cotmeh- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

## NY: Li Efrîn, Girê Spî û Serê Kaniyê sûcê şer têne kirin



**Neteweyên Yekbûyî (NY) ragihand ku êrişên dewleta Tirk ên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û kiryarên wê yên li herêmên dagirkirî di çarçoveya sûcên şer de ye û careke din bang li welatan kir ku welatiyên xwe ji Wargeha Holê bigirin.**

Komîsyona Lêpirsîna Sûriyeyê ya Navneteweyî ya Neteweyên Yekbûyî (NY) rapora Sûriyeyê ya ku xwe dispêre lêpirsînên li herêmê û serdema 1'ê Çileyê – 30'ê Hezîrana 2022'yan beriya Rûniştinên Mafên Mirovan a 51'emîn NY eşkere kir.

Serokê Komîsyona Lêpirsînê Paulo Pinheiro û edamên komîsyonê Hann Magally û Lznn Welcham civîneke çapemeniyê lidarixistin.

Serokê Komîsyona Lêpirsînê Paulo Pinheiro diyar kir ku Sûriye nikare şerekî nû hilgire û derbarê raporê de nirxandin kir û got;"Sûriye nikare şerekî berfirehtir hilgire, lê dibe ku welat ber bi vê rewşê ve biçe."

Paulo Pinheiro diyar kir li Sûriyê binpêkirinên mafên mirovan û alozî zêdetir bûye û bal kişand ser gef û êrişên ku Tirkiye li hemberî Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike.

Li raporê de tê gotin ku li Efrîn, Girê Spî û Serê Kaniyê sûcê şer têne kirin û wiha tê gotin: "Sivîlên tê îddîakirin têkiliya wan bi hêzên Kurd û Rêveberiya Xweser re hene, bi awayekî kêfî tên binçavkirin, êşkence li wan tê kirin û hinek jê piştî ku tên binçavkirin tên windakirin. Aqûbeta hinek kesan jî nayê zanîn. Jinên tên binçavkirin û girtin jî êrişên zayendî li ser wan tê kirin."

Herwiha tê gotin ku artêşa Tirk milkiyetên taybet desteser dike. Di raporê de hate diyarkirin ku li qadên di bin kontrola Tirkiyê de eger binpêkirinên mafan were kirin, berpirsê vê Tirkiye ye û ev tişt hate gotin:"Artêşa Tirk û çekdarên wê ji bo armancên xwe yên leşkerî milkên sivîlan bi kar tînin. Wekî mînak ji 2020'an ve tê astengkirin ku şêniyên Kurd ên gundê Dawûdiyê yê herêma Serê Kaniyê vegerin warên xwe, mala gelek kesên ji wan hate hilweşandin. Artêşa Tirk milkiyeta taybet desteser dike û mafê tazmînatê yê gundiyan tune dihesibîne, ev jî tê wateya ku binpêkirina hiqûqa mirovî ya navneteweyî."

**NY: Êrîşa ser Kobanê yek ji sûcê şer e**


Di raporê de qala êrîşa di 8'ê Çileya 2022'an de ya li Kobanê ku kesekî jiyana xwe dest da û 12 jî birîndar bûn hate kirin. NY'yê diyar kir ku ji bo ku mirov bibêje ev êriş di çarçoveya sûcê şer de ye sedemên maqûl hene.

Di raporê de qala êrîşên ku Tirkiye bi dronên biçek dike jî hate kirin û hate gotin di van êrişan de kesên sivîl dibin hedef.

Neteweyên Yekbûyî (NY) careke din bang li welatan kir ku welatiyên xwe ji Wargeha Holê bigirin.

Ev rapor wê di 22'yê Îlonê de li Ofîsa Cenevreyê ya NY'yê wê pêşkêşî Rûniştinên Mafên Mirovan a 51'emîn were kirin.-***ROJNEWS***

## 'Ruhê nebatan heye'



**David Bowen ew nebat, bi dîwarî ve zeliqandiye û li ser pelên wê sensor bi cih kirine. Bi saya sinyalên ku sensor dişînin ev kêr dilebite.**

Gava meriv dibêjin, ruhê nebatan jî heye, ev yek ne belesebeb e. Hin mînak vê yeke bi awayekî zindî dikarin raxin ber çavên mirovan. Înstalasyona David Bowen ya bi navê "Plant Machete" nîşana vê yekê ye û ew nîşan dide ku ruhê nebatan jî heye. Ev cûreyê kulîlkan ya bi navê "Filodendron" dikare weke mirovekî vê kêra mezin bi kar bîne ango bilivîne. Dema mirov înstalasyona David Bowen dibîne, ji mirov re xerîb tê û mirov naxwaze bawer bike lê di rastiyê de ev nebat weke robotekî kar dike û dikare vê kêra mezin bi çend awayan bi kar bîne. Yanî ew weke aqilekî ku bi mirovan re heye, dikare tevbigere.

David Bowen ew nebat, bi dîwarî ve zeliqandiye û li ser pelên wê sensor bi cih kirine. Bi saya sinyalên ku sensor dişînin ev kêr dilebite. Kesî bawer nedikir ku tiştekî wisa wê pêk were, lê David Bowen tevgerên ku ev nebat weke robotekî pêk anîn, girtin kamerayê û dîmenên wê parve kirin.-***Ozgurpolitika***

## Dixwazin jîngehparêzî di nava xelkê de bibe çandek





**Komek ciwanên jîngeparêz li Herêma Balekayetî pêngavek jîngeparêziyê ya bi navê 'Ji gelaş ber bi xezîneyê' dane destpêkirin. Piraniya xwe kesên di pêngavê de cih digrin xwendekarên dibistanên seretayîne. Endamên pêngavê dibêjin, ew dixwazin jîngeparêziyê di nava xelkê de weke çandek lê bikin.**

Komek ciwanên jîngeparêz li Herêma Balekayetî pêngavek jîngeparêziyê bi navê 'Ji gelaş ber bi xezîneyê' ve dane destpêkirin. Di pêngavê de piraniya xwe zarokên dibistana seretayî cih digrin, cihên ku berê ji aliyê geştiyaran ve li Herêma Balekayetî hatine pîskirin, têne paqijkirin. Bi vê pêngavê re ciwan dixwazin zarok ferî parastina jîngehê bibin.



Zarokeka ku tevlî pêngavê bûyî Roze Mihemede ji me re axivî û got: "Ez bi komek hevalên xwe re tevlî vê pêngava ji bo parastina jîngehê bûme. Em niha cihên ku ji aliyê geştiyaran ve hatine qirêjkirin, yan jî gelaş lê mayîn, paqij dikin. Ji bo jîngehek tendurist û xwezayî divê her der paqij were girtin."

Li Balekayetî salane pêngavên paqijiyê ji aliyê jîngeparêzan ve tê destpêkirin, piraniya xwe cihên geştiyaran têne paqijkirin û madeyên plastîk têne komkirin.

Yek ji endama pêngava paqijiyê Estêre Xazî di derbarê pêngavê de wiha got: "Armanca sereke ya vê pêngavê ewe ku xwendekar diwarê jîngeparêziyê de baldar bin. Ji bo vê jî me zarokên dibistanên seretayî jî xistin nava pêngavê ku bikarin dema pêş de zêdetir bala xwe bidin ser paqijiya jîngehê û biparêzin."

Estêre dawiya axaftina xwe de got: "Beriya ku em dest bi pêngavê bikin, em derbarê jîngehê de xelkê hişyar dikin, piştre jî bi awayek pratîkî dikevin nava liv û tevgerê. Piştî wê kelûpelên li cihên geştiyarî û di nava xwezayî de wek gemar hatine avêtin, kom dikîn. Hinek plastîk û paşmayên din jî em kom dikin û di karên şêwekarî û hunerî de bikartînin. Herî dawî jî em wan hunerên bi wan kel û pelan hatine çêkirin, di pêşangehekê de nîşan didin. Em dixwazin bi vê yekê jîngeparêzî ji aliyê her kesê ve weke çandek lê were."- ***ROJNEWS***

### Sudoku:Pirs 16

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | | 6 | 3 | | | 9 | 5 | |
| | 4 | | | | | | 1 | |
| | | 9 | 5 | 2 | | | | 8 |
| 7 | | | | 6 | | | | |
| | 8 | | 9 | | 7 | | 2 | |
| | | | | 1 | | | | 6 |
| 1 | | | | 8 | 9 | 3 | | |
| | 5 | | | | | | 8 | |
| | 3 | 7 | | | 2 | 4 | | 9 |

### Sudoku: Bersiv 15

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 3 | 9 | 4 | 7 | 8 | 1 | 5 | 6 | 2 |
| 2 | 5 | 8 | 3 | 6 | 4 | 9 | 7 | 1 |
| 7 | 1 | 6 | 2 | 9 | 5 | 8 | 4 | 3 |
| 4 | 3 | 7 | 8 | 5 | 6 | 1 | 2 | 9 |
| 9 | 6 | 5 | 1 | 2 | 7 | 3 | 8 | 4 |
| 8 | 2 | 1 | 4 | 3 | 9 | 7 | 5 | 6 |
| 6 | 8 | 2 | 9 | 7 | 3 | 4 | 1 | 5 |
| 1 | 7 | 3 | 5 | 4 | 2 | 6 | 9 | 8 |
| 5 | 4 | 9 | 6 | 1 | 8 | 2 | 3 | 7 |

### Quncika Têgînan

| Bertek | Derketina li hemberî tiştekî, nerazîbûn: Li hemberî kiryarên wî bertek nîşan da. |
|---|---|
| Şênî | Yên li ciyekî ava dijîn: Şêniyên gund cejin pîroz dikirin. |
| Şênber | Tiştên ku mirov dikare destê xwe bide wan û bibîne. Melmûs: Weke kevir, av, dar… |
| Razber | Tiştên nayên girtin û dîtin. Tersê şênber: Weke heskirin, xemgînî… |
| Bîrdozî | Koma fikrên ku di warê siyasî, hiqûqî, zanistî, felsefî û dînî de rê didin ber tevgerên komekê, partiyekê yan rêveberiyekê. Îdeolojî. |
| Guncaw | Tişta bi kêr tê. Mûnasib: |
| Pêman/pêwan | Wesîle: Bi pêmana salvegerê şahiyek hat lidarxistin. |
| Hişmendî | Têgihîştin, zêhniyet: Hişmendiya wî ya derbarê jinan de ne rast e. |
| Vegirtin | Standina erdekî, milkekî bi darê zorê ji kesekî. Dagîrkirin: Welatê me vegirtin. Wateyên wê yên din jî hene. |
| Bişaftin | Helîna hêdî hêdî: Kevaniyê keşk bişaftin û dewê wan berda ser xwarinê. Herwiha bi mecazî tê wateya asîmîlebûn û asîmîlekiriinê jî: Civaka ne azad be tê bişaftin. |

## `Felsefeya Rêber Apo ji Komploya Navneteweyî mezintir e`

Hevserokê Meclisa Zagonsaz ya herêma Efrînê Silêman Cafer diyar kir ku armanca Komploya Navneteweyî ya ser Rêber Ocalan, tunekirina gelê kurd e û got, felsefeya rêber Apo ji komploya navnetewî û ji tecrîda girankirî mastire.***R-4***

## `Stratejiya Şerê Gelê Şoreşgerî misogeriya têkbirina dagirkeriyê ye`

Tevgera Ciwanên Şoreşger ya herêma Efrînê ji bo bi rêxistinkirina ciwanan li gorî stratejiya Şerê Gelê Şoreşgerî komxebatek li herêma Şehbayê li darxistin. ***R-5***

Şopdara Rastiyê ye
# Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1006 | 19-Cotmeh - 2022 | www.ronahi.net/ku/

# AZADÎ BI VÎNE FAŞÎZM BI ÇEKE

Di 16 Îlonê de rejîma Îranê jîna Emînî ya kurd bi îşkenceyê qetil kir. Bûyera Jîna Emînî bû teyîsandina bertek û tengasîyên gel yên li dijî desthilata Îranê. Herwiha ev bertek bi pêşengiya jinan bû serhildana li dîjî dîktatoriyê. Bi rojane jin bi civakê re li hember êrişên rejîma Îranê bi vînekê mezin li ber xwe didin û her ku diçe ev serhildane belav dibe. Herî dawî ev serhildane gihaşt zîndanan û li hember girtiyan çekên giran hatin bikar anîn. Lê disa jî nekarîn pêşî li serhildanan bigrin.




## Bi hatina zivistanê re êş û azarên koçberên Waşokanî zêde dibin



Koçberên bajarê Serê Kaniyê yên ku li kampa Waşokanî dimînin, diyar kirin ku bi hatina zivstanê re ew rastî gelek zehmetiyan tên û gotin, tevî rewşa me ya xirab rêxistinên mirovî jî ji me re nabin alîkar. ***R-6***

## Jin, Çalakî û Şoreş



Ji pênûsa Sara Kerem

Dengê lingên şoreşa 'Jin Jiyan Azadî' tê... werin em guh bidin dengê vê şoreşê û em tev bibin parçeyek ji vê şoreşê. Eger em li cihê xwe bêdengiya xwe biparêzin, em ê li gel xwezayê ji aliyê vê pergala hov ve bên daqurtandin. ***R-2***

## `Li dora dirûşmeya `Jin JIYAN AZADÎ` têkoşînê bilind bikin`



Endama Koordînasyona KJAR'ê Peyman Viyan helwesta serhildanê divê dewam bike û got, em bang li jinan û hemû gelên Îranê dikin ku serehildanên xwe dewam bikin û têkoşînê bilind bikin. ***R-4***

## Fîlmê `Kurmê Darê`: Dijminê kal û bavan nabe dostê ewladan



Tîma fîlmê "Kurmê Darê" hewl dide balê bikişîne ser ajantiyê û xiyanetê, sedemên vê yekê dikole. Lîstikvanê fîlmê Cuma Mihemed got: "Hişyarkirina civakê bi hevkarên dagirkeriya Tirk armanca fîlmê ye. Dijminê kal û bavan nabe dostê ewladan." **R-7**

## KODAR'ê: Ji bo rûmet û jiyana girtiyan biherikin qadan


Komîteya Girtiya a KODAR'ê derbarê êrişa hêzên Îranê ya ser girtîgeha Evînê hişiyarî da û got, rejîma Îranê ji jiyana Zeyneb Celaliyan û hemû girtiyên siyasî berpirse, li hemberî van kiryaran divê gel dakeve qadan. ***R-3***

## HPG`ê : 13 leşkerên Tirk ên dagirker hatin cezakirin

HPG`ê ragehand ku di encama çalakiyên hêzên wan de 13 leşkerên Tirk yên dagirker hatin cezakirin. ***R-3***

## Li Misirê "Kampa Jinan" bi dawî bû

***R-2***



DILYAR CIZÎRÎ
LI EFRÎNÊ ÇI DIKIN?
*R-4*

Zekî Bedran
Tirkiye belavkirina xerabiyê.....
*R-5*

# Jin, Çalakî û Şoreş

Dengê lingên şoreşa ‘Jin Jiyan Azadî’ tê... werin em guh bidin dengê vê şoreşê û em tev bibin parçeyek ji vê şoreşê. Eger em li cihê xwe bêdengiya xwe biparêzin, em ê li gel xwezayê ji aliyê vê pergala hov ve bên daqurtandin.

**Sara Kerem**

Serhildanên bi pêşengiya jinan li Rojhilatê Kurdistanê dest pê kir û li cîhanê belav bû, tê wateya serhildanên ‘Êdî Bes e Ji Pergala Mêr ya Zordar re’. Jinên Kurd di pozîsyona pêşengiya azadiya jinên cîhanê de ne û ev yek êdî jiyanî dibe. Kuştina Jîna Emînî bû çirûska agirê vê şoreşê û bi pêşengiya dirûşma ‘Jin Jiyan Azadî’ ev çirûsk roj bi roj mezin dibe. Helbet jin, yanî zayenda herî bindest, koledar ku nîvê civakê ye, li dijî pergala hov ya ku hemû nirxên civakê ji holê radike, xwezayê tine dike; hemû jiyanê di herimîne, rabûna ser pîyan û bi serhildana helwesta ‘Êdî Bese’ pêşketineke girîng e ku wê dîrokê berovajî bike. Lê divê em ji bîr nekin ku sîstema zêdetirî 5 hezar sal in xwe kiriye hêzeke cîhanî û xwe bi koletî û paşguhkirina jin û civakê afirandî. Ji bo wê ne gengaze ku rê li pêşiya şoreşa jinê, bi hêsanî veke. Li ser vê rastiyê, ji bilî piştgiriya ji serhildanên li Îran û Rojhilatê Kurdistanê re, divê li çar aliyên cîhanê hemû jin rabin ser piyan û qêrîna tekoşîna azadiya jinê bibe cîhanî.



Li hemû welat û dewletên cîhanê pêwîstî bi şoreşa jinê heye. Ji ber ku jin li her derê û li gorî cihê xwe bi awayên cuda tên bindestkirin, civak jî di şexsê wê de hatiye kolekirin. Jinên ku hewl didin vê koletiyê bişkînin jî di hedefa pergala zilam a heyî de ne. Mînaka vê ya herî dawî jî Nagîhan Akarsel’e ku di pêşengiya xeta azadiya jinê de li dijî pergala mêr a serdest hemû jiyana xwe, da têkoşîna azadiya gelan.

Bi taybetî di van salên dawî de, jinên şoreşger û pêşeng yên weke Nagihan bêyî ku pêwîstî bi veşartina kujeran bibînin, li pêş çavê raya giştî dibin armanc.

Tevî ku di Şoreşa Rojava de, bi pêşengiya jina kurd, tevayiya cîhanê ji beleya çeteyên DAIŞ’ê bû jî, dewleta Tirk a faşîst weke ku tola çeteyên DAIŞ’ê hiltîne, van jinên şoreşger yek bi yek li ber çavê cîhanê qetil dike. Lê cîhan li hemberî van êrîş û komkujiyan di bêdengiya mirinê de ye. Çavê xwe, guhê xwe û devê xwe girtiye! Weke ku tê zanîn Sakîne Cansiz û du hevalên wê yên jin jî, di sala 2013’an de li Parîsê hatibûn qetilkirin. Li “Fransa mezin”, sê jinên şoreşger yên Kurd ji aliyê MÎT’a dewleta Tirk a faşîst ve hatin qetilkirin. Û dîsa ew dewletên ku xwe bi navê demokrasiyê û pêşketinên nûjen didin nasîn, rûpelê dîroka xwe ya gemar kişandin ser rûyê xwe û xwe bêdeng kirin.

Sakîne Cansiz, pêşenga dîrokî ya Têkoşîna Azadiyê ya Kurd û di heman demê de ya Têkoşîna Azadiya Jinê bû, ku 40 sal bi îradeyeke mezin li dijî dewleta Tirk a faşîst a dagirker têkoşiya. Lewma dewleta Tirk di şexsê wê de hemû jinên pêşeng û şoreşger hedef girt. Piştî şahadeta Sakîne Cansiz dewleta Tirk bi dijwarî dest bi kumkujiyên xwe yên li ser jinên Kurd kir. Helbet vê carê ne tenê jina pêşeng, Tirkiyeyê li dijî hemû jinan dest bi qirkirinekê kir û ev qirkirin didome: Weke ku tola DAIŞ’ê hiltîne, êrîşî jinên pêşengên şoreşa Rojava dike, êrişê jinên gerîla dike, êrişê jinên rewşembîr, rojnamevan, hûnermend, siyasetmedar û hwd. dike.

Lê çima ev bêdengî? Ji ber ku Jina pêşeng, ya zana, ya bi hêz û şoreşger kabûsa dewletên hegemonîk yên kapîtalîst yên xwe weke azadîxwaz nîşan didin û di esasê xwe de jî dijminên jinan û belaya hemû azadiyan e. Ger jina azad civakê bi rê ve bibe, pergala baviksalarî wê têk biçe, civak wê birînên xwe bipêçe û hemû nirxên xwe yên hatîn dizîn wê ji pergala gemar bistîne.

Wê demê divê hemû civakên ku wate û girîngiyê dide nirxên mirovahiyê û jinan, bibin yek û dawî li lîstikên pergala serdest ya mêr bînin. Kujerê Sakîne Cansiz, Jîna Emînî û Nagîhan Akarsel qet û qet nehatin girtin û hesab ji wan nehat pirsîn. Kujerê ‘yekane’ yê jinê û yê nirxên civakî sîstema dewletparêz a bi zîhniyeta serdest a mêr hatinye avakirin e.

Dengê lingên şoreşa ‘Jin Jiyan Azadî’ tê... werin em guh bidin dengê vê şoreşê û em tev bibin parçeyek ji vê şoreşê, eger em li cihê xwe bêdengiya xwe biparêzin em ê li gel xwezayê ji aliyê vê pergala canawir ve bên daqurtandin

# Li Misirê “Kampa Jinan” bi dawî bû

**Jinên li kampa ku ji aliyê Weqfa Mafên Jinan a Parêzerên Jin ên Misrê ve li Îskenderiyê hat li dar xistin li hev civiyan, li dijî tundiya li ser jinan, plana çalakiyên 16 rojan derxistin.**

Kampa ku ji aliyê Weqfa Mafên Jinan a Parêzerên Jin ên Misrê ve li Îskenderiyeyê bi dirûşma “Amadekirina jinên pêşeng ji bo dadmendiyê û mafên tevahî jinan” hatibû li dar xistin, bi reze çareserî û pêşniyarên li dijî tundiya li ser bingeha zayendî ya civakî bi dawî bû. Jinên ku beşdarî kampê bûn, nîqaşên ku nirxandine bi ajansa me re parve kirin.

### Li dijî tundiyê rêbazên têkoşînê nîqaş kirin

Ji Weqfa Mafên Jinan a Parêzerên Jin ên Misrê Heba Adel da zanîn ku armanca sereke ya kampê li dijî tundiyê hilberîna pêşniyarên çareseriyê ye. Heba Adel wiha got: “Yek ji rojeva herî girîng a kampê, mijara tundiya li ser bingeha zayendiya civakê bû. Jin bi her cure tundiyê re rû bi rû ne, ji bilî vê tevî ku li welat sûcê jî hêj zarok keç tên sinetkirin. Me li kampê mijara tundî û sinetkirinê axivî û derbarê rêbazên têkoşînê de pêşniyarên çareseriyê dît. Di vê çarçoveyê de li dijî tundiyê kampanyayek 16 rojan bê meşandin û jinan der barê vê kampanyayê de pêşniyarên cuda kirin.

### “Tê xwestin jin di nav çar dîwaran de bên heps kirin”

Heba Adel, diyar kir ku divê jinên ku rastî tundiyê tên re her cure piştgirî bidin jî girtine rojeva xwe, gotinên xwe wiha domand: “Li dijî tundiyê hevgirtina jinan girîng e. Me bi vê kampê re xwest hem têkiliya di navbera xwe de xurtir bikin û hem jî pirsgirêkên jinan biaxivin. Wek tê zanîn jin ji ber feraseta baviksalarî bi zextên civakî re rû bi rû ne. Bi taybeti di bin navê oleke de li ser jinan gelek ferzkirin tên pêkanîn. Jinên ku hewl didin ji hemû qadên jiyanê bên dûrxistin, dixwazin di nava çar dîwaran de heps bikin. Ji bo şikandina van hemûyan pêwîstiya me demek dirêj heye.”

### “Divê cezayên li dijî tundiyê bên girankirin”

Asîstana Parlamentoyê, Endama Konseya Neteweyî ya Jinan û Direktora Îcrayê ya Weqfa Jinên Ereb û Afrîkayê René Wadih Najib jî diyar kir ku bi saya nîqaşên li kampê hatine meşandin gelek agahî bi dest xistine. René Wedîh Necîb destnîşan kir ku li kampê tercûme hatine axaftin û wiha got: “Dema min di Partiya Misirî yên Azad de wek sekretera jinan kar kir, bi Konseya Neteweyî ya Jinan re li dijî tundiya li ser jinan xebet da meşandin. Em çûn cem jinan û di van hevdîtinan de em rastî gelek bûyerên tundiyê hatin. Jinan bi taybetî bal kişandin ser di dozên êrişa zayendî de astengiyên qanûnî. Konseya Neteweyî ya Jinan li qadan xebatên xwe dimeşîne û her cure piştgiriyê dide jinan. Lê belê divê qanûnên heyî bi bandor-



tir bin û cezayên li dijî tundiya li ser jinê bên girankirin. Ji bo vê jî pêwîsti xebateke hin zêdetir heye.”

### “Divê rêbazên têkoşînê yên li ser bingeha tundiyê bên pêşxistin”

Yek ji xebatkara weqfa jinên parêzer, ji bo mafê jinên misrê parêzera cûdabûnê û endama konseya dewletê Aya Motamed di derbarê qampê de nirxandin kir. Aya Motemed ya anî ziman kamp gelek berhemdar derbas bû, parvekirina beşdaran ya tercûbeyên xwe gelekî bi qîmet e. Aya Motemed da zanîn ku tundiya li ser bingeha zayendiya civakî hatiye bi dest xistin û wiha axivî: “Me berê xwe da koka pirsgirêkên tê jiyîn û çareseriyan pêşniyar kir. Her jin ji eniya xwe tecrûbeyên xwe parve kirin û çavdêriyên xwe parve kirin. Tundiya li dijî jinê li hemû cîhanê heye û divê rêbazên têkoşînê yên hevpar bên pêşxistin. Pêwîstî bi guhertin û veguhertineke civakî heye.”

***JINHA/Qahîre***



# Fîlmê `Kurmê Darê`: Dijminê kal û bavan nabe dostê ewladan

Tîma fîlmê “Kurmê Darê” hewl dide balê bikişîne ser sîxûrî û xiyanetê, sedemên vê yekê dikole. Lîstikvanê fîlmê Cuma Mihemed got: “Hişyarkirina civakê bi hevkarên dagirkeriya Tirk armanca fîlmê ye. Dijminê kal û bavan nabe dostê ewladan.”

Di nav vê wêran û aloziyan de, huner bûye navgîna herî girîng a ravekirinê. Aliyên hunerî hewl didin peyamên şoreşgerî yên redker ragihînin da ku planên li dijî gelên herêmê têk bibin.

Hêzên dagirker, di serî de jî dewleta Tirk a dagirker bi şerê taybet ku dimeşîne hewl dide gelên herêmê teslîm bigire û wan ber bi wêraniyê ve bibe, her wiha çanda wan a resen û zimanê wan asîmîle bike. Dagirkeriya Tirk hin kurdan dixapînin ji bo sîxurtiyê ji wan re bikin û destkeftiyên Rêveberiya Xweser têk bibin. Ji bo wê jî rewşa aborî ya li cîhanê bi kar tînin. Li beramber van hewldanan, aliyên hunerî bi rêya fîlmê “Kurmê Darê” civakê hişyar bikin.



Koma şehîd Osman (Bavê Teyar berê) ya Navenda Çand û Huner a Serdemê ya Hêzên Xweparastinê ya Herêma Cizîrê amadekariyên pêşandana fîlmê “Kurmê Darê” dikin. Di fîlmê de gelek hunermend û lîstikvan cihê xwe digirin weke; Cuma Mihemed (Bavê Teyar), Îsa Oso, Hecar Remo, Bêrîvan Oso, Zeyneb Xeyrudîn, Asim Sîno, zarok jî; Cûdî û Nobel Lewand

Mehek pêwîst bû heta ku film hazir bibe ku senaryoya wê Behcet Lewand nivîsiye û Mihdî Îsa derhêneriya wê kiriye.

Bûyerên fîlmê têkildarî bikaranîna hêzên kurdî ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve ji bo ku pere bi dest bixin û xwe li paş perdeya doza kurd veşêrin. Her wiha hevkariya wan bi dagirkeriya Tirk re nîşan dide û çawa ciwanan bi pereyan dixapînin, ji bo ku kesayetên navdar ên şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê bikin hedef. Çawa xayîn û ajanan erkdan dikin û doza gelê çewisandî, binpê dikin.

Cume Mihemed yek ji hunermendên ku beşdarî fîlmê bûne diyar kir ku ew fîlman her dem weke bûyerên ku li herêmên wan diqewimin, amade dikin da ku ev fîlm bibin xwedî wate û hin pirsgirêkan çareser bikin û wiha domand: “Ji ber ku tîmên me ji aliyê gel ve tê şopandin û bi deng in, pêwîst bû ku em fîlmek wiha amade bikin ji ber gelek xayîn, ajan û sîxur li herêmê di vê dawiyê de zêde bûne.”

Mihemed wiha dewam kir: “ Tiştê herî zêde ku me dixwest em bal bikşînin ser, hin partiyê siyasî yên idîa dikin ku ew ji bo doza Kurd û berjewendiya gel dixebitin. Li aliyekî din xayin û sîxurên ku bûne sedema şehadeta fermandarên leşkerî û sivîlan, eşkere bikin. Her wiha me dixwest ku gel rastiya xayinan, karê wan û ji kê fermanên xwe digirin, nas bike.”

Mihemed destnîşan kir ku armanca vê fîlmê ew e ku kesên alîkariya dewleta Tirk dikin, hişyar bikin, ji ber dijminê bav û kalan nabe dostê zarokên wan û ev li gotinên xwe zêde kir: “Di dagirkirina Serêkaniyê, Girê Spî û Efrînê de gelek hêzên kurd hevkariya dewleta Tirk kir. Îro jî bi wan itîraf nake. Me bi rêya vê fîlmê bal kişand ser wan kesan ku tenê bi gotin banga mafên gel dikin û li dawiyê dagirkeriya Tirk dev ji wan berdide.”

Mihemed bang li hevkarên dewleta Tirk ên ku welatê û gelê xwe ji



bo pere difroşin kir û got: “Dev ji rêya ku wan hibijartiye berdin û bi saziyên sivîl û leşkerî re bibin alîkar da ku rê li ber xiyanet û sîxuran bigirin. Her wiha li kêleka Rêvberiya Xweser a ku bi saya xwîna şehîdan ava bûye bisekinin û destkeftiyên wê biparêze.”

Mihemed diyar kir ku di dawiya fîlmê de eşkere dibe ku çawa dewleta Tirk dev ji kesên hevkariya wê kirine berdide piştî ku planên wê bi encamên bibin.

Mihemed di dawiyê de got: “Gelê kurd tecrubeyên zehmet der bas kiriye û divê dersê jê bigire. Dagirkeriya Tirk nikare me lawaz bike. Bi her şehadetekê re rihê berxwedan û israra li ser serkeftinê û têkoşîna li hember hemû cûreyên êrişan zêde dibe.”

***ANHA***

# Pira Orient-Express

**Orient-Express weke komeleyeke sînemayê li Bernê hatiye damezirandin. Ew bi vê komeleyê dixwazin di navbera rojava û rojhilat de bi filman pirekê ava bikin û çandên ji hev cihê bidin naskirin.**

Orient-Ekpress, komeleyek e ku li Bernê ji hêla çend sînemavanan ve qederê 3 salan e hatiye damezirandin. Weke komeleyeke serbixwe û avangard kar dike û dixwaze li Swîsreyê ji bo filmên Tirkî û Kurdî platformekê ava bike da ku film karibin li wir werin nîşandan û danasîna filmên derhênerên Kurd û Tirk bike. A rast, ew zêdetir filmên li Rojhilata Navîn hatine çêkirin, nîşan didin û piştgiriyê didin wan. Armanca komeleyê ew e ku di navbera çand û welatan de pirekê ava bike û bi riya vê pire çandên cihê bide naskirin û bike ku xelk hay ji van çandên ji hev cihê hebe. Di vê çarçoveyê de ev nêzî 3 salan e ku bi navê “Rojên Filman yên Orient-Express” festîvaleke filman li dar dixe. Her wiha di van rojan de li ser sînemayê kargeh û hevpeyvînan jî çêdikin. Tenê ne festîval, her wiha ew kargeh, kon-




ser û hefteyên çandî jî organîze dikin û di van rojan de hewl didin bi huner derdê xwe vebêjin.

Aydın Sevînç weke serokê komeleyê, pêşengtiya vî karî dike û Andrea Fuhrer jî piştevaniya komeleyê dike da ku komele bêhtir bi derûdorê re têkiliyan çêke û were naskirin. Ji lewra jî ew di warê wergerê de dixebite û komeleyê dide naskirin. Wan dema dest bi vî karî kiriye, li ser navê komeleyê û festîvalê jî fikiriye û di dawiyê de ev nav hilbijartiye. Wan ji filma “Murder on the Orient Express” yê ku ji ber romana Agatha Christie hatibû girtin, îlham girtiye û ev nav li festîvala xwe kiriye. Her wiha bi navê “Orient Express” trêneke navdar jî hebû ku di salên 1883 û 1977’an di navbera Parîs û Stenbolê de dixebitî. Ji ber van sedeman, ev navê festîvalê di heman demê de têkiliyê di navbera rojava û rojhilat de jî îfade dike.

### Babeta îsal ‘ekolojî’ ye

Festîvala “Orient Express” a 2022’yan bi dirûşmeya “Azadiya Ekolojîk” dê di navbera Cotmeh û Berfanbarê de were lidarxistin. Orient Express ji bo temaya xwe ya îsal dibêje, “Orient Express her sal li Swîsreyê di çarçoveya hin fikr û ramanan de bijarteyeke filman hazir dike û nîşan dide. Di salên bihurî de ji bo em balê bibin ser babeta “bêsînorî” yê û bi aweyekî etîk, estetîk û polîtîk niqaş bikin, gelek film nîşan dan. Îsal jî girêdayî vê yekê em ê di warê ekolojiye de nîqaşan bikin û me babeta îsal weke ‘ekolojî’ neqand. Pirsgirêkên ku di navbera azadî û sînoran de derdikevin hemberî me, di meseleya ekolojiyê de jî xwe didin der û divê em bi awayekî polîtîk, estetîk û etîk li ser ekolojiyê bisekinin û bifikirin.”

### Filmên Kurdî jî tên nîşandan

Weke salên bihurî, îsal jî gelek film cara ewilî li Ewrûpayê tên nîşandan. Di nav filmên hatine neqandin de filma “Govenda Alî û Zîn” a Mehmet Alî Konar, filma “Di nav çar dîwaran de” ya Bahman Ghobadî, “The Exam (Ezmûn)” a Şewket Emîn Korkî, “Heft Senfoniyên Zagrosê” ya Parviz Rostamî, “Nosema” ya Etna Ozbek, “Monolog” a Selîm Yildiz û kurtefilma “Navnîşan” ya Aram Dildar hene. Her wiha ji gelek welatên din jî metrajedirêj, belgefilm û kurtefilm dê werin nîşandan. Filmên îsal dê di 25 û 30’ê Cotmehê de li Bernê, di 2 û 6’ê Mijdarê de li Zurichê, di 4 û 6’ê Mijdarê de li Luzernê, di 9 û 13’ê Mijdarê de li Baselê û di navbera 2 û 18’ê Berfanbarê de jî li St. Gallenê werin nîşandan.

Festîval bi sponsoriya gelek sazî û komeleyên Swîsreyî tê lidarxistin.

***-Ozgurpolitika***

# Bi hatina zivistanê re êş û azarên koçberên Waşokanî zêde dibin

Koçberên bajarê Serê Kaniyê yên ku li kampa Waşokanî dimînin, diyar kirin ku bi hatina zivistanê re ew rastî gelek zehmetiyan tên û gotin, tevî rewşa me ya xirab rêxistinên mirovî jî ji me re nabin alîkar.

**Darîn Silê/Hesekê**

Koçberên bajarê Serê Kaniyê yên ku li kampa Waşokanî dimînin, diyar kirin ku bi hatina zivstanê re ew rastî gelek zehmetiyan tên û gotin, tevî rewşa me ya xirab rêxistinên mirovî jî ji me re nabin alîkar.
Koçberên Serê Kaniyê yên li kampa Waşokanî dimînin piştî ku bajarê wan ji aliyê dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê ve hat dagîrkirin û bi darê zorê ji mal û milkên xwe hatin dûrxistin, neçar bûn ku li kampê bi cih bibin, lewra ji bilî kampan ti rê li pêşiya wan nîne ku pê ve biçin.

Koçber rastî gelek Zor û zehmetiyên jiyanê tên. Bi taybet di hatina zivistanê re bi êş û azarên mezin re rûbirû dimînin. Tevî daxwaz û bangewaziyên wan yên rojane, ti kes ji wan re nabe alîkar û her sal ew di rewşa xwe ya berê de derbas dibin.
Di dema zivistanê de koçberên vê kampê ji ber sermayê, kêmxwarinê û nepaqijiyê gelek nexweşî bi wan re çêdibin. Herwiha di demekê ku nexweşî zêde bûye û pir belav dibe, koçberan pêdiviyên jiyanê, yên xweparastina ji nexweşiyê û mazota germkirinê ji wan re nayên peydekirin. Ji ber ku Jimara koçberên li kampê jî pir mezine û derfetên rêveberiya kampê jî nîne ku pêwîstiya tevayiya koçberan bi cî bîne. Herwiha rêxistinên mirovî û yên girêdayî koçberan jî, pêvîstiyên koçberan pêşevajî nakin.

Derbarê rewşa koçberaên li kampa Waşokanî koçberên li kampê ji me re axivîn û behsa êş û zehmetiyên ku di dema zivistanê de dikşînin kirin.

**`Pêwîstiya me bi gelek pêdiviyan heye`**

Koçbera ji bajarê Serêkaniya dagirkirî Lîna Salih ku li kampa Waşokanî dimîne, rewşa xwe ya bi hatina zivistanê re anî ziman û wiha got: "Di zivistanê de pêwîstiya me bi gelek pêdiviyan heye, wekî çadirên ku me ji sermayê



biparêzin. Tevayiya konên li kampê jî yên kevnin û pêwîstiya wan bi guhertinê heye. Bi kurtahî ne alavên germkirinê, ne jî cilên me yên zivistanê ku me ji sermayê biparêzin hene."

**'Konên em têde me ne ji germê ne jî ji sermê diparêzin'**

Lîna got, ev sê sal in em di bin vî konê xirab de dijîn, heta niha ev kon nehatiye guhertin. Bi hatina zivistanê re em zehmetiyan di bin konan de dibînin, ji ber ku me ne ji baranê ne jî ji sermaya dijwar diparêze. Ava qirêj derbasî konan dibe û laşê me jî ji sermayê dilerize. Her sal rewşa me eve. Rewşa koçberên Serê Kaniyê eve, yan di bin topbarana dagîrkeran de dimirin, yan jî di binê konan de mirinê dibînin.
Lîna da zanîn ku pêwîstiyên zivistanê yên ku salê carekê li wan tên belavkirin, ew jî dereng dimînin û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Mazota ji bo germkirinê di dawiya zivistanê tê belavkirin. Ji bo wê jî



heta ku mazot dighêje me, em ji sermayê diqerisin û derfetên me jî nînin ku mazota taybet ji xwe re peyda bikin."

**`Divê rêxistinên mirovî berpirsyariyên xwe li hember koçberan pêk bînin`**

Lîna Salih di dawiya axaftina xwe de got, tevî rewşa me ya xirab heta niha rêxistinên mirovî tu alîkarî ji me re pêşkêş nekirine. Divê rêxistinên qaşo ji bo mirovan dixebitin, berpirsyariyên xwe li hember koçberên li kampan pêk bînin û alîkariyê pêşkêşî wan bikin. Da ku êş û azarê koçberan sivik bibin.

**`Em li hember her tiştî li ber xwe didin`**

Koçbera bi navê Rîma Elî ku ew jî ji destpêkê li kampa Waşokanî bi cih bûye wiha got: "Di zivistanê de konê me tijî av dibe, em di nav heriye û qirêjê de dimînin. Ma mirovahî li ku ye. Li ser me komkujî tên kirin. Ma wijdanê mirovahiyê mirî ye. Em li hember her tiştî li



ber xwe didin."

**`Eger rewş wisa be wê gelek nexweşî di nav koçberên kampê de belav bibin`**

Rîma da xuyakirin ku nêzî 6 meh in pêdiviyên paqijiyê negihîştiye destê wan û wiha pê da çû: "Tevî derketina nexweşiyên cûda, demeke dirêje pêdiviyên paqijiyê yên parastina ji nexweşiyan negihiştine me. Ji bo wê jî eger rewş wisa be wê gelek nexweşî di nav koçberên kampê de belav bibin. Herwiha got, serfa sihî ya kampê jî pir xirabe. Niha li ber her konî koncalek hatiye çêkirin, da ku ava qirêj û gemara heyî bikeve wê koncalê."
Rîma di dawiya axaftina xwe de destnîşan kir ku derfetên xizmetguzariyê yên ku di hindirê kampê de tên pêşkêşkirin pir kêm in û jimara koçberan jî zêde ye. Em bihêvîne çareseriyek ji tevayiya koçberên li kampê re bê dîtin. Da ku êşa koçberiya me sivik bibe û em rojên xwe bi ewlehî derbas bikin.

# Li Şedadê nexweşxaneya gel hat vekirin

**Nexweşxaneya Gel a Şedadê xizmetê ji bêtirî 350 hezar welatiyên başûrê kantona Hesekê re pêşkêş dike û ev gav ji aliyê şêniyan ve bi kêfxweşî hat pêşwazîkirin.**

Desteya Tenduristiyê ya Herêma Cizîrê di 6'ê Cotmehê de nexweşxaneya gel li navçeya Şedadê vekir. Nexweşxane ji 4 beşên sereke pêk tê ku xizmetên tenduristî ji welatiyan re pêşkêş dike.

Ev nexweşxane navenda tenduristiyê ya tekane ya herêma başûrê Hesekê ye ku xebatên xwe ji 350 hezar kesî re pêşkêş dike. Piştî ku nexweşxane ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve hat talankirin û amûrên wê hatin dizîn, ji nû ve hat avakirin ku lêçûna wê jî gihîşt 514 hezar dolarî.
Beşên ku niha li nexweşxaneyê hatine vekirin ev in: Lezgîn, taqîgeh, nexweşiyên jinan û klînîkên gerok. Ji bo vekirina beşên din, ji aliyê Desteya Tenduristiyê ve xebat




tên kirin.

Ferhan El Xelef ku ji şêniyên Gundê 46 ê Şedadê ye, wiha axivî: "Wek van projeyên xizmetguzariyê hêviyên me mezin dikin û pêdiviya me ya bi nexweşxaneyê peyda dikin. Berê em neçar bûn ku nexweşên xwe bibin Hesekê û Qamişloyê, ev jî ji bo me di aliyê lêçûnê de barekî giran bû."

Her wiha, welatiyê bi navê Husam El Esed wiha anî ziman: "Hebûna nexweşxaneyê li herêma başûrê Hesekê pir girîng e, ji ber ku berê nexweş rêyên dirêj qut dikirin, ku di gelek rewşan de jî pêwîstiya



bi nexweşxaneyeke nêzîk hebû."
El Esad wiha domand: "Îro ev nexweşxane dermankirinê ji hemû bajarok û navçeyên herêma başûrê Hesekê re peyda dike û tevî ku bi temamî nehatiya amadekirin, lê ji bo şêniyan tiştekî pir baş e."
Der barê wergirtina nexweşan de, gerînendeyê Nexweşxaneya Gel a Şedadê Husam El Elî ji ajansa me re wiha axivî: "Ji roja destpêkê ve



me dest bi wergirtina nexweşan kir, lê xizmetên me tenê di 4 beşan de ne. Ji aliyê Desteya Tenduristiyê ve ji bo amadekirina beşa x-ray (rontgen) soz hat dayîn."
Di dawiya axaftina xwe de, Husam El Elî diyar kir ku ew li hêviya destekdayîna Desteya Tenduristiyê ne ku nexweşxane di rojên pêş de bi temamî amade bibe.
***ANHA***



# KODAR'ê: Ji bo rûmet û jiyana girtiyan biherikin qadan

Komîteya Girtiya a KODAR'ê derbarê êrişa hêzên Îranê ya ser girtîgeha Evînê hişyarî da û got, rejîma Îranê ji jiyana Zeyneb Celaliyan û hemû girtiyên siyasî berpirse, li hemberî van kiryaran divê gel dakeve qadan

**Navenda Nûçya**

Komîteya Girtiyan a Komelgeha Demokratîk û Azadî ya Rojhilatê Kurdistanê (KODAR), têkildarî êrîşa hêzên Îranê ya li ser Girtîgeha Evînê hişyarî da û bang li gelên Îran û Rojhilatê Kurdistanê kir ku biherikin qadan.

KODAR'ê diyar kir ku li gel êrîş û şewata mezin a hêzên rejîma Îranê ya li ser Girtîgeha Evînê, gule li girtiyan barandin, bi qasî bûyereke trajîk, ji ber qedexeya medyaya rejîmê û kêmaniyên heyî têkildarî asta bûyerê agahiyên zelal nehatine girtin û got: "Êrîşên serkutkirinê yên şeva bihurî û bi zanebûn qetilkirina girtiyan a li Girtîgeha Evînê li dijî hemû gelan û lêgerînerên azadiyê bûye navenda serdegirtin û zilmê."

KODAR'ê da xuyakirin ku rejîm ji bo girtiyên siyasî, aktivîstên sivîl ên girtî bitepisînin û serkut bikin, vekirî serî li rêbaza avakirina kaos û seneryoyan daye û wiha domand: "Piştî xwepêşandanên 28 roj in li pey xwe hişt, bi hezaran ciwanên hezkiriyên azadiyê hatin girtin û şandin girtîgehê, bê şik û guman rejîmê li hember van ketiye pey seneryoyên xeternak. Rejîm divê baş zanibe bi van seneryoyên zextê wê nikare pêşiya serhildanên gel bigire. 43 sal in, girtîgeh li dijî rejîma zextê, bûye navendên lêgerîna berxwedan û azadiyê. Seneryoya rejîmê ya şeva bihurî, tê wateya dewama qetlîama girtiyên siyasî ya sala 1988'an. Divê gelê bi xîret û serhildêr ê Îranê baş zanibe ku ev bi van cûre kiryarên tirsê û terorê dixwaze serhildanê bitepisîne."

KODAR'ê da zanîn ku bûyerên li Girtîgeha Evîn a Tehranê li dijî hemû girtiyên jin-mêr û dîsa aktivîstên siyasî yên li girtîgehên li Îran û Rojhilatê Kurdistanê ye û wiha daxuyaniya xwe qedand: "Ji ber kiryarên komployî û zextên li ser girtiyan em hişyarî didin. Rejîma Îranê di serî de ji jiyana Zeyneb Celaliyan û hemû girtiyên siyasî




berpirs dibînin. Ji bo wê di serî de bang li hemû gelê Kurd gelê hezkiriyên azadiyê yên Îranê dikin ku ji bo parastina rûmet û jiyana girtiyên siyasî, dîsa parastina destketiyê serhildana 28 roj in li dû xwe hiştiye, biherikin hemû qadan. Yekîtiya gelan dikare hewldanên kuştina hêzên muxalîf û girtiyan pûç bike."

# HPG`ê : 13 leşkerên Tirk ên dagirker hatin cezakirin

**Navenda Nûçya**

**HPG`ê ragehand ku di encama çalakiyên hêzên wan de 13 leşkerên Tirk yên dagirker hatin cezakirin.**

Hêzên Parastina Gel HPG`ê bi daxuyaniyekê diyar kir ku hêzên wan 13 leşkerên Tirk yên dagirker ceza kirin.

HPG`ê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku Gerîlayên Azadiyê yên Kurdistanê bi rêbaza şerê tîm ê pispor li her qadê derbên giran li artêşa Tirk a dagirker dixin û got: "Bi çalakiyan hate ispatkirin ku rêbaza şerê tîm ê pispor ji metropolan heta bi Bakurê Kurdistanê, ji




Bakur heta bi Herêmên Parastinê yên Medyayê li her derê teknîk û îstîxbarata dijmin dikare bê pûçkirin û derbên gelekî bi bandor ji nişka ve li dijmin bê xistin."
HPG`ê da xuyakirin ku hêzên wan bi performansa şer a bilind û bi taktîkên afirîner hem derbên xurt li dijmin dixin hem jî çewtkirin û derewên eniya şerê taybet a Tirk pûç dikin û wiha dewam kir: "Tîmên me yên profesyonel ên xwe bi ruhê fedaî yê Apoyî xurt kirine, bi çalakiya xwe ya dawî ya li Botanê ev yek careke din ispat kirin û raxistin pêş çavan.Di encama çalakiyên hêzên me de 13 dagirker hatin cezakirin, dagirkerek jî birîndar bû."

HPG`ê ragehand ku 13'ê Cotmehê saet di 09:00 de li navçeya Şax a Wanê li qada Kato Xelîlayê, tîmên me yên bi tevger ên YJA Starê komeke dagirkeran a ji 13 kesî xistin bin kontrola xwe. Herwiha da zanîn ku hêzên wan saet di 17:50'î de ji sê baskan ve bi rengekî koordîneyî bi çekên ferdî li dagirkrean xistin. Di vê çalakiyê de ku ji sê baskan ve bi çekên ferdî û ji nêz ve li dagirkeran hate xistin, 10 dagirker hatin cezakirin, dagirkerek jî birîndar bû. Piştî ku helîkopterên êrîşê û balafirên şer bombardûmaneke giran li qadê kirin, dijmin mirî û birîndarên xwe bi 5 helîkopterên Skorsky ji qadê birin.

HPG`ê diyar kir ku 16'ê Cotmehê saet di 09:00, 12:00 û 15:50'î de li Qada Berxwedanê ya Çemçoyê, tîmên wan yên bi tevger bi çekên giran sê caran li dagirkeran xistin. Di encama van çalakiyan de 3 dagirker hatin cezakirin.Di16'ê Cotmehê saet di 22:00 de li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî tîmên me yên bi tevger bi çekên giran li dagirkeran xistin.

# TEV-DEM: Rejîma Îranê hewl dide tolê ji îradeya gelan hilîne

**Navenda Nûçya**

**TEV-DEM`ê derxistina şewatê ya li Girtîgeha Evîn a Tehranê şermezar kir û got, divê rêxistinên hiqûqî , yên jinan, rêxistinên civaka sivîl, hêzên demokratîk û siyasî destek û piştgiriyê bidin îradeya gelên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê.**

Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) bi daxuyaniyekê şewata li Girtîgeha Evîn a li bakurê paytexta Îran Tehranê şermezar kir û banga xwedîderketina li serhildana li Rojhilatê Kurdisatnê û Îranê kir.
TEV-DEM`ê da xuyakirin ku li seranserî bajarên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê pêla xwepêşandan û çalakiyan berfireh dibe û bi pêşengiya jinan û bi dirûşmeya (Jin, Jiyan Azadî) ev xwepêşandan veguherîn şoreşa civakî, demokratîk û exlaqî ya nûjen.
TEV-DEM`ê diyar kir ku rêjîma Îranê ji bo rawestandina têkoşîna şoreşgerî ya bi pêşeniya jinan bêçare ma ye û got: "Jin bûye sembola îradeya azad û pîroz û asta bandoriya wê ya mirovî li herêmê û cîhanê, nemaze li tevger û rêxistinên jin û ciwanan belav bû."
TEV-DEM`ê balkişand ser zextên rejîma Îranê yên li ser xwepêşanderan û got: "Ruxmî hemû hewldan û rêbazên tepisandinê û bikaranîna guleyan, ruxmî ku artêş û hêzên ewlehî yên rejîma molla li kolanên bajaran belav bûn da ku careke din serweriya xwe li dijî nirx û exlaqên gel û pêkhateyên hevgirtî yên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê ferz bike lê bi bin ket, ji ber ku rejîmê xeta tundiya plankirî hilbijart û sûcên zêdetir li ser jin û zarokan pêk anîn da ku îradeya wan bişkîne."
TEV-DEM`ê da xuyakirin ku rejîma Îranê hewl dide tolê ji îradeya gelan hilîne û wiha got: "Li şûna ku diyalogên civakî yên demokratîk ji bo dîtina çareseriyên bingehîn û aştiyane yên guncaw ava bike, lê dîktatoriyê nîjadperest a rejîma molla şoreşa azadî û edaleta civakî tehemul nake, ji ber vê yekê agir berda girtîgeha Evîn, di encamê de bi dehan girtiyên siyasî hatin qetilkirin û gelek jî birîndar bûn."
TEV-DEM`ê da zaînîn ku şewata zindana Evîn sûcek li dijî mirovahî û li dijî îradeya gelan û got: "Em bang li Neteweyên Yekbûyî û rêxistinên



hiqûqî û yên jinan û tevahî rêxistinên civaka sivîl û hêzên demokratîk û siyasî yên li herêmê kir ku destek û piştgiriyê bidin îradeya gelên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê û zext li rêjîma Îranê bikin da ku binpêkirinên xwe rawestîne."

# `Felsefeya Rêber Apo ji Komploya Navneteweyî mezintir e`

Hevserokê Meclisa Zagonsaz ya herêma Efrînê Silêman Cafer diyar kir ku armanca Komploya Navneteweyî ya ser Rêber Ocalan, tunekirina gelê kurd e û got, felsefeya rêber Apo ji komploya navnetewî û ji tecrîda girankirî mastire.

**Zana Roj/ Şehba**

Beriya 24 salan di şexsê Rêber Abdullah Ocalan de bi derxistina ji Sûriyê re Komploya Navneteweyi, ya li ser gelê kurd û gelê azadîxwaz dest pê kir. Rêber Ocalan 15'ê Sibata 1999'an radestî dewleta Tirk hate kirin, di nava şert û mercên tecrîda giran a li Girtîgeha Îmraliyê de, heya niha tekoşîna azadiya gelan didomîne. Ev 19 meh in bi tu awayî, agahî ji Rêber Apo nehatine girtin. Rêber Abdullah Ocalan ji bo azadiya gelê Kurd û tevayiya gelên bindest, herwiha ji bo guhartina zihniyeta dewletparêz û moderNîteya kapîtalîzm, bi pergala xwe ya Netewa Demokratîk berxwedan û têkoşîneke pir bi heybet dimeşîne. Hêzên komploger xwestin di şexsê Rêber Ocalan de tunebûna gelê kurd misoger bikin. Lê bi saya têkoşîna Rêber Apo û ya Tevgera Azadiya Kurdistanê û gelên azadîxwaz, komploger negihiştin armanca xwe.

Derbarê Komploya Navnetewî ya li ser Rêberê gelê Kurd Abdulah Ocalan, hevserokê Meclîsa Zagonsaz a herêma Efrînê Silêman Cafer ji me re axivî.

Silêman Cafer Komploya navnetewyî ya ser Rêber Apo şermezar kir û wiha got: "Komploya ser Rêber Apo komployek navnetewî bû. nêzî 50 hêzên navnetewî, partî û dewletan têde cî girt. Komplogeran dîtin ku fikrê Rêber Ocalan û têkoşîna Tevgera Azadiya Kurdistanê li ser desthilatdariya wan ya ku bi xwîn û keda gelan avakirî xetere, bi hemû hêza xwe beşdarî komployê bûn."

**"Pirojeya demokrasiyê desthilatdariya wan hejand"**

Silêman di axaftina xwe de da diyar kirin ku Rêber Ocalan, bi pergala xwe ya ji bo azadiya gelan ava kirî, xeterî li ser sîstema desthilatdar ya hêzên navdewletî da avakirin. Silêman Cafer wiha berdewam kir: "Pirojeya dewletên hegemon yên li rojhilat ya li ser Rojhilata Navîn, rûb rû pergala netewa demokratîk ya ku ji aliyê Rêber Apo ve hatî pêşkêşkirin hat. Lewra van dewletan ne karî vê pirojeya xwe ya xirabkirina Rojhilata Navîn pêk bînin. Ango armaca NATO û Amerîka hat pûçkirin. Ji ber vê yekê ramanên Rêber Ocalan bû bend li pêşiya dewletên navnetewî yên ku dixwastin bikevin Rojhilata Navîn û perçebikin. Ev jî bû sedem ku hemû dewlet bibin yek û pîlanên xwe yên girtina Rêbertî bixin piratîkê û bi tecrîdekê giran ji gel qut bikin".

Silêman wiha domand: "Ji bo bi dawî kirina vê komployê tu dewlet û rêxistinên mirovî nebûn alîkar; rêxistina CPT qaşo mafê girtiyan diparêze, derbasî Îmraliyê dibin



lê, tû agahiyan di derheqê rewşa Rêbertî de nadin. Ev jî tê wê wateyê ku hemû rêxistinên mirovî û eleqedar, ji bo berjewendiyên dewletên navnetewî û yên wek Tirkiyê dixebitin."

Silêman Cafer bîr xist ku piştî dîlgirtina Rêber Apo, bi gîştî rewşa cîhanê û teybet jî rewşa Rojhilata Navîn ber bi kaoseke mezin ve diçe. Herwiha da diyarkirin ku ji derveyî tekoşîn û şoreşa azadiyê ya ku li Kurdistanê bi pergala Rêber Apo didome, tû hêzên din li dijî vê kaosê tekoşîn nakin û çareseriyê ji gel re nabînin.



## LI EFRÎNÊ ÇI DIKIN?

**DILYAR CIZÎRÎ**

Di van rojên derbasbûyî de çeteyên Heyet Tehrîr El-Şam (Heyet El-Nusra) bi hêzeke mezin êrîşî Efrîna dagirkirî kir. Di navbera wan û çeteyên din ên ser bi Tirkiyê ve şer derket. Tevî şerê li Efrînê li ber pozê artêşa Tirk pêk hat, xwe wekî haya wan ji meseleyê nîne, nîşan dan. Şerê em behsê dikin, şerê çend sal berê, yê li Babê qaşo di navbera çeteyên Dewleta Tirk û DAIŞ'ê de rû dayi tîne bîra mirov. Wê demê şerekî çêkirî hate nîşandan û DAIŞ'ê Bab û derdora wê radestî çeteyên girêdayî dewleta Tirk kir. Niha jî hema bêje heman sînaryo tê nîşandan. Dewleta Tirk wê demê ji raya giştî re nîşan da ku ew li dijî DAIŞ'ê ye. Tevî di rastiyê de hemû piştgiriya DAIŞ'ê ji aliyê dewleta Tirk ve dihat kirin jî, Ji aliyekî din xwest berxwedan û serkeftinên QSD'ê yên wê demê li dijî DAIŞ'ê ji raya giştî veşêre û bi filimê girtina Babê, bêje emin yên ku DAIŞ'ê têk dibin.

Lê tişta niha hatiye guhertin, dewleta Tirk bi Rûsya re di nava danûstendinan de ye, da bi hikûmeta Şamê re ittîfaq bike. Li aliyê din jî ne aramî û bûyerên ne ji rêzê yên li herêmê dagirkirî zêde bûne. Ev jî bandorê li ser projeya dewleta Tirk a bi cihkirina koçberan dike û di qadên navdewletî de dijberiyên wan zêde dike.

Ji ber vê yekê dewleta Tirk bi van gavên xwe, destpêkê Rûsiya û hikûmeta Şamê ya niha pê re di nava danûstendinan de ye, razî dike. Her du alî wê bi hêsanî karibin her derê bombebaran bikin. Dibe di demên pêş de jî li dijî hin herêmên Idlibê êrişan pêk bînin û hin herêman bi awyekî plankirî ji destê Cebhet El-Nusra bigrin.

Li aliyê din dewleta Tirk dixwaze serweriya herêmên di bin dagikiriya wê de, di bin yek alî de be. Da ji raya giştî re nîşan bide ew dikare koçberên Sûriyê li wan herêman bi cih bike. Yenî bi wate ew ê îda bike ku herêm arame. Ji xwe wiha jî komên çete yên girêdayî xwe yên li dijî agahiyên itîfaqa wan, bi hikûmeta Şamê re derketin, terbiye kir û peyama "ew mecbûrin wekî Tirkiyê tevbigerin" da. Bi wate armanca dewleta Tirk ji vê sînaryoyê çend çivîkan bi kevirekî bikuje.

Ji xwe hêzên Sûriyaya Demokratîk (QSD) di vê derbarê de nerîna xwe da û got, ji bo wan û gelê Sûriyê tu cûdahî di navbera çeteyên Dewleta Tirk de nîne. Nusra û çeteyên din ji hev ne cûda ne û hemû bi ferman û fînanseya dewleta Tirk tevdigerin. Tişta berê jî ev nerîn piştrast kiriye, kuştin û girtina DAIŞ'ê li herêmên Idlib, Ezaz, Serêkaniyê û hemû herêmên di bin dagirkirina hemû cûreyên çeteyên dewleta Tirk de pêk hatine.

Eger Koalîsyona Navdewletî ya li dijî DAIŞ'ê, li Sûriyê de hedefa xwe ya tunekirina DAIŞ'ê de cidî be, gerek planên xwe bide guhertin û di stratejiya xwe de, şerê li dijî El-Nusra û komên girêdayî dewleta Tirk bide destpêkirin.

# `Li dora dirûşmeya`Jin JIYAN AZADÎ`têkoşînê bilind bikin`

**Navenda nûçeyan**

**Endama Koordînasyona KJAR'ê Peyman Viyan helwesta serhildanê divê dewam bike û got, em bang li jinan û hemû gelên Îranê dikin ku serehildanên xwe dewam bikin û têkoşînê bilind bikin.**

Derbarê serhildanên li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê, Koordînasyona KJAR'ê Peyman Viyan ji ajansa ANF'ê re axivî.

Peyman Viyan diyar kir ku çirûska azadiyê ya bi şehadeta Jîna Emînî rû da li tevahiya cîhanê belav bû û wiha got: "Rastiya rejîma Îranê ku 43 sal in li ser desthilatdariyê ye bi neteweperestî, olperestî û mejiyê zayendîperestî hikum li her qada jiyanê dike, destavêtinê dike. Bi vê rastiyê mejî û avaniya xwe ya sîstemî, êrîşî hemû nirxên civakî û bedena jinê dike. Sîstema vê rejîmê û saziyên wê di her kêliya jiyanê de êrîşî rastiya gelên li Îranê dikin û qetil dikin. Jiyan ji aliyê pergala bi serweriya mêr ve hatiye dîlgirtin. Bi êrîşa li dijî Jîna Emînî re, rejîmê hewl da ku tirsê bixe nava tevahiya welêt de. Lê belê ev plan bi ser neket, hêrs û nerazîbûna jin û civakê ya 43 salan a li hemberî rejîmê teqiya."

**`Çirûsk û daxwaza azadiyê li Kurdistanê geş bû`**

Peyman Viyan da xuyakirin ku jin û gel ti carî bi rastiya rejîma heyî ya Îranê re nebûn yek û sekna xwe ya şoreşgerî ya li dijî rejîmê her tim dewam kirine û wiha dewam kir: "Gel di nava 43 salan de gelek caran li hemberî rejîma heyî rabû ser piyan. Gelan û jinan ti carî sîstema heyî qebûl nekirin û diyar kirin ku wê teslîmî sîstemê nebin. Di nava 8-9 salan de gel bênavber rabû serhildanê. Mînak mamoste, karker-kedkar û jinan nerazîbûna xwe timî bi xwepêşandanan nîşan dan. Eger mirov cudahiya wê bi şênberî raxin pêş çavan; gelên ku li dora Jîna li hev civiyan, bi yek dengê daxwaza azadiyê dikin. Çirûsk û daxwaza azadiyê li Kurdistanê geş bû. Gel û jin nîşan didin ku wan Paradîgmaya Civaka Azadîparêziya Jinê ya Ekolojîk Demokratîk a Rêber Apo pejirandine û bi biryar in ku konfederalîzma demokratîk li dora vê paradîgmayê ava bikin.Formul û dirûşma 'Jin, Jiyan, Azadî' veguherî sembola jiyana hevpar a gelan."

**`Divê gel bi rêxistin, hestiyartir û di nava yekîtiyê de tevbigerin`**

Peyman Viyan da zanîn ku Jin û ciwan ji bo daxwazên xwe yên azadiyê misoger bikin divê helwesta xwe ya serhildanê bidomînin û wiha got: "Îran xwedî mozaîka çandî ya dewlemend e, li Îranê pêkhateyeke pirneteweyî heye. Pêwîste hemû beşên civakê zêdetir xwe bi rêxistin bikin. Ji bo ku ev pêvajoya şoreşgerî nekeve xizmeta kesên ku xwe weke muxalefet û opozisyon pênase dikin, divê gel bi rêxistin, hestiyartir û di nava yekîtiyê de tevbigerin. Zîhniyeta van beşên ku xwe weke mûxalefet pênase dikin jî faşîst û zayendperest e. Gel û jinan bi formula 'Jin Jiyan Azadî' alternatîfên xwe danîn holê. Divê zêdetir vê formulê pêk bînin û heya daxwazên xwe bi dest nexin, divê dev ji qadan û kolanan bernedin."

Peyman Viyan diyar kir ku ger rejîma Îranê deriyên guhertineke demokratîk a rasteqîn veneke, ev bertek nayên bêdengkirin, wê bi belavbûna serhildanê bidomin û



wiha got: " Divê gel di platformên azad de bên gel hev, rê û rêbazên avakirina sîstema demokratîk, wekhevîxwaz û azadîxwaz a ku dixwazin binirxînin. Divê helwesta xwe hîn radîkal bike û rejîmê neçar bike ku gavekê bavêje."

**`Li dora dirûşmeya`Jin JIYAN AZADÎ` bicivin û têkoşînê bilind bikin`**

Koordînasyona KJAR'ê Peyman Viyan bang li jinan û hemû gelên Îranê kir ku li dora dirûşmeya kampanyaya xwe bicivin, bibin yek, xwe bi rêxistin bikin û têkoşînê bilind bikin. Herwiha bang li jinên Besic ku endam û wekîlên meclisa Şûre ne û xizmeta zihniyeta zayendperest, olî û neteweperest a rejîma Îranê dikin, kir ku ji rêye desthilata mêr vegerin û li dora daxwazên gelan û jinan bicivin.



# `Stratejiya Şerê Gelê Şoreşgerî misogeriya têkbirina dagirkeriyê ye`

**Zana Roj/ Şehba**

Tevgera Ciwanên Şoreşger ya herêma Efrînê ji bo bi rêxistinkirina ciwanan li gorî stratejiya Şerê Gelê Şoreşgerî komxebatek li herêma Şehbayê li darxist.



Di 16 ê cotmehê de, Tevgera Ciwanên Şoreşger a herêma Efrînê komxebatek li darxistin. Armanca komxebatê, rêxistinkirina ciwanan li ser bingeha Şerê Gelê Şoreşgerî û giringiya wê di vê pêvajoyê de. Di komxebatê de, bi dehan rêveber û endamên Tevgera Ciwanan yên herêma Şehbayê beşdarî komxebatê bûn, her wiha nîqaşên berfireh hatin meşandin û di dawiyê de bi perspektîfên xurt hatin derxistin.

Li ser giringiya Şerê Gelê Şoreşgerî û armanca komxebata ciwanan, endamên Tevgera Ciwanên Şoreşger ya herêma Efrînê ji me re axivîn.

**`Bi şerê taybet dixwazin jin û ciwanan têk bibin`**

Endama Meclisa Tevgera Ciwanên Şoreşger ya herêma Efrînê Emîne Ebdo bal kişand ser girîngiya Şerê Gelê Şoreşgerî ji bo parastina deskeftiyan û wiha got: "di sedsala 21`an de, şerê ku tê kirin bi temamî di navbera moderNîteya kapîtalîzm û demokrasiyê de ye, hêzên hegemon bi her awayî dixwazin li ser tavahî mirovahiyê bandora xwe bidin çêkirin, bi taybet li ser jin û ciwanan bi rêbazên şerê taybet, bi hemû hêza xwe dixebite da ku ciwanekî lawaz û li gor berjewendiyên netewdewlet bide avakirin".

Emîne diyar kir ku ji bo sekna li hember siyaseta dijmin û şerê taybet yê li ser ciwanan tê meşandin, pêkanîna stratejiya şerê gelê şoreşgerî pêwîste û wiha domand: "Ji bo ku em bikaribin tevahî aramanc û siyaseta ku li ser ciwanan tê meşandin vala derxinin, divê em ciwan di çawaniya pêkanîna stratejiya şerê gelê şoreşgerî xwe zana bikin û vê bi gel re parvebikin".

**"Hêza herikîn û pêkanînê, ciwan in"**

Endama Meclisa Tevgera Ciwanên Şoreşger ya herêma Efrînê Emîne Ebdo da zanîn ku hêza yekemîn ya ku bikaribe stratejiya Şerê Gelê Şoreşgerî di nava civakê de biherikîne, ciwanin û axaftina xwe wiha qedand: "Emê di lidarxistina van komxebatan bidomînin û em di wê baweriyê de ne ku jin û ciwan wê bi hev re, wê civakê ji desthilatên hov rizgar bikin û wê şoreşa azadiya gelan pêk bînin."

**`Ji şerê azadiyê re pêşengtî erka ciwana ye`**

Endamê Tevgera Ciwanên Şoreşger Reşîd Silêman jî, diyar kir ku armanca wan ji van komxebatan,






ewe ku li gorî Şerê Gelê Şoreşgerî, civak û ciwanan birêxistin bikin û got, Armanca me em bikaribin pêşengtiyeke rast ji pêvajoyê re bikin. Ji erka ciwanaye ku li hember şerê ku li tavahî Kurdistanê tê meşandin, tekoşina herî xurt bimeşînin û hemû pîlanên dijmin têk bibin".

**`Emê şerê azadiyê bi ser bixin`**

Reşîd Silêman axaftina xwe wiha qedand: "Emê bi gelê xwe re ji temenê 7 salî heyanî 70 salî bikaribin bi rihê şerê gelê şoreşger jiyan bikin û şerê azadiyê bi ser bixînin, ancax em bi vî rihî dawiyê li dagirkeriyê bînin."

## Tirkiye belavkirina xerabiyê didomîne



**Zekî BEDRAN**

Tirkiyê li Sûrî çavkaniya xerabiya û hamleyên xwe yê nû didomîne. Niha jî hêzên El Nusra derbasî Efrînê dike. Efrîn bin dagirkeriya dewleta Tirkan de ye. Bi destê dewleta Tirkan nebe, ew nikarin werin xwe li wir bicîh bikin. Tirkiyê, li aliyekê bi Rusya re hevdîtinên xwe zêde dike, aliyêkdin jî qada desthilatdariya El Nusra fireh dike. Gelo ma ev tişt bê agahiyê Rusya çêdibe? Ev pirsek girînge.

Di van rojanda Erdogan, gaveke ku Putîn aciz bibe bi hesanî nikare bavêje. Putin got:" Em difikirin Tirkiyê bikin navenda gazê ku ji bo awropa bê firotin. Erdogan bi lez û bez xwe avêt ser vê daxwuyaniyê û ji bo gelê Tirkiyê dest bi pesnên xwe yên ku beje 'ez serokek çikas mezinim û çend rolê mezin dilîzim' kir. Her wiha hilbijartin jî nîzîk dibin. Ji bo ku ji Rusya pereyê germ were, her tiştî dike. DYA, banka û şîrketên Tirkiyê hişyar kir û got; 'ambargoya ku hember Rusya tê meşandin pêk bînin'. Di rewşeke wiha de Erdogan, hember Putîn li Sûrî gaveke wiha ciddî nikare bavêje.

Derbaskirina El Nusra yali herêmên weke Efrin tişteke ji rêzê nîne. Van pêşketinan, derdorên peywendîdar wê bi baldarî bişopînin û binirxînin. Erdogan ji aliyekêve hewl dide El Nusra xort bike û bike mixatabek fermî û weke hêzeke meşrû bide pejirandin. Ji aliyekedin jî El Nusra weke hêzeke şer li hember rojhilatê Firatê bikar bîne. Çeteyên ku li rojhilatê Firatê şandibûn li ser gel pir belavebûn û ji hev qutbûn. Wan jî pir xirab bikar anî, lê bi wan re zêdetir nedikarî bimeşe. El Nusra li ser çeteyên berê hat zêdekirin û bi şekleke çalak dixwazin tevlî pêşketinan bikin.

Gelên Sûrî nav xizaniyeke mizindeye. Hûkûmeta Şamê, gel mecbûrî berîya 2011'an dike. Ya wê bîat bikin yan jî wê dev ji welatê xwe berdin û biçin. Qet fikirandineke Gûhertin û reformên demokratik nîne. Gel di navbera çeteyan û nîzamê baas de asê maye. Li herêmên Xweseriyê de gel zêdetir çalak û herikbare, dikare nîqaş bike. Dikare derkeve qadan li hember dagirkerî û faşîzmê Tirkan, dengê xwe bilind bike. Ji bo dagirkerî bi dawî bikin û êrîşan bişkînin, amadekariya şer jî di tê de, nav xebat û lêgerînekde ye. Lê rêveberiya Şam naxwaze gelekî xwedî îrade û helwest bibîne. Dema wiha dibe, Rusya li ser Sûrî hîn zêdetir azadiya tevgerandinê bidest dixe û bi Tirkiyê ve lihev dike û peymanan çêdike.

Gelo, Tirkiyê agahî yê wî ji hêzên mezin nîne, El Nusra derbasî Efrîn`ê dike? Ev yek ne pêkan e. El Nusra hem lîsteya teror ya Rusya hem jî ya DYA û hevpeymaniya navnetewî de ye. Li ser Tirkiyê jî zext kirin û wê jî bê xwasteka xwe, El Nusra weke rêxistineke teror pejirand. Hêzeke ku wê bi xwe xistiye nav lîsteya teror de, bê agahiyê hêzên navnetewî nikare li Sûrî belav bike. Li İdlib'ê jî artêşa Tirkan wan xistibûn bin parastinê. DYA û Awropa bi gefa kerta koçberan îqna kiribû ku, çavê xwe bigrin û alîkarbin. Cihana rojava ne dixwastin ku Rusya û hûkûmetê Sûrî xort bibin. Ji bo vê pejirandin ku Idlîb destê El Nusra de bimîne û bin parastina Tirkiyê de be.

Erdogan çi dibe bila bibe, israrê xwe ya ji holê rakirina herêmên xweser, her roj ji cîhanêre dide xwuyakirin. Dijminayiya Kurdan asteke waha de ye ku, sefîrê Tirkan ya Bexdayê dibêje ``em yekîtiya xaka Iraq`ê ji Iraq`îyan zêdetir diparêzin.`` Sedemê wî jî tê zanîn; bila Kurd dayîka xwe nebîne! Heman tişt li Sûrî jî derbasdare.

Erdogan, Tirkiyê ber bi rûxandinekê sîyasî û aborî ve bir û Mohra xwe li diziyên mezin û neheqiyên mezin xist. Tiştên destê wî de hene ji bo winda neke, bi mirina xwe bi desthilatdarî pêçandiye. Jixwe DYA û NATO her tim alîkarî dane Tirkiyê. Niha jî dixwaze Rusya bike şirîkê qirkirina kurdan. Putin jî di merheleyek zehmet re derbas dibe. Şerê Ukrayna ji bo wan giran derbas dibe. Putîn bi hişmendiya, 'em Erdogan çikas hember NATO û DYA bikare bikarbîne fayde ye' tevdigere. Her wiha mafê bikarhanîna esmanî da û ji bo dagerkeriya Efrînê rê vekir. Niha dewleta Tirkan bi SÎHA yan gelek caran êrîş kirin, jixwe êrîşên tank û topan her roj hene. Mafê Tirkiyê ji bo li Sûrî bimîne nîne. Hêzeke dagirkerî ya eşkere ye. Rûxmî vê jî dixwazin Tirkiyê bikin şirîkê Sûrî. Di vê de rolê Rusya mezine.

Rolê Rusya li herêmên weke Efrîn hîn zêdetir e. Ji ber vê em li ser wî sekinîn. Lê, heta niha me daxwuyaniyek wan li hember bicîhkirina El Nusra ji bo Efrînê nedît. Helwestê ku Rusya bigre pir girînge. Bi baldarî divê bê şopandin.